

Rewşenbîr ne leşkerê kesîne

Rewşenbîr û ramanger nikarin ji bo berjewendî yên hinek kom, kes, derûdor, hizb û pêkhate, yên di nava civakê de kar dikin, li gorî daxwaz û ferman ê wan tevbigerin.

Rewşenbîr dîtina xwe ya azad, ku çewa ew bi xwe rast dibîne, bi şarezeyî û analîzeke rasteqîn kufş dike û helwest nîşan dide û bi wî awayî jî qodên sosyolîya civaka xwe dixwune û li gorî van pîvan û qrîtera karê xwe dike.

Ez bawerim di vî warî de hinek tişt, ji alîyê hîn kesan û derûdoran ne rast tene eşnaskirin. Ji wan werkirî rewşenbîr leşker û şervanên yekîne yên artêşê ne û lewma jî, dibe li gorî ferman û biryarên wan rabûnûrûniştina xwe birêkûpêk bikin.

Lê dibe ev rastî di hemû şert û mercan de bi xete ke sitûr bê destnîşankirin, ku rewşenbîr ne leşkerê kesîne û ti caran jî pêywîste rewşenbîr nebîne leşkerê kesî...

Ev rastî hevîrtirşê hevîrê rewşenbîrtîye ye!

Ji ber vê rastîyê, rewşenbîr ne mecbûre kar û emel ê xwe bi kesî bide pejirandin.

Welatên em tê de dijîn, malxotîyê ji dehan hizb û pêkhateyan re dike. Her yek ji wan pêkhateyan xwedîyê stratejî, plansazî, reşbelek, bername û rojeva ne.

Înca, ku her yek ji wan rabe û li gorî berjewendî, maf û sûdwerî ya hizb û pêkhate ya xwe, situwê rewşenbîr têxe

bin nîrê xwe, hingê hemû pîvanên sivil û medenî wê bikevin bin pîya û ew ê rewşenbîrê civaka xwe bi destê xwe binax bike û bikuje.

Ji ber, ku rewşenbîr bi sekn û helwest a azad dikare rewşenbîrtîyê bikarbîne, ango vatinî, erk û vecîbe yê xwe azad bicîh bîne.

“Lê dibe ev rastî di hemû şert û mercan de bi xete ke sitûr bê destnîşankirin rewşenbîr, ku ne leşkerê kesîne û ti caran jî pêywîste rewşenbîr nebîne leşkerê kesî”

Helbet rewşenbîr ji kar û barê civaka xwe re neynike, ûjdanê vîn a gel e.

Lê belê ti kes û derûdor, divê rewşenbîr ne mîna xulam û rênçberê hizb û pêkhate ya bibînin û bi vî awayî helwest bistînin.

Her beş, derûdor, pêkhatû û sazî yên civakê; ji kerema xwe re, destê xwe ji qirik û bestika rewşenbîra derxin û bihêlin, ku rewşenbîr erk û vecîbe yên xwe, yê biûjdan û şareze ji bo xizmetguzarî û xulamîya gel û civak a me, yên perîşanbûyî pêkbînin.

Qet û qet dibe neyê jibîrkin, ku rewşenbîr bi şûrê kesî naçîne şer!

01.01.2021, Cemal Bulut